

Dumahîk: Çiyayê Kurmêc...

Careke dî, bi navê parta Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê , em serê we hemiyar sax dikin .

Bila heval , hogir û dostên mamoste Reşîd Hemo sax bin .

Keç û law û mervên rehmetî xweş bin .

Sipas ji guhdariya we re .

Gundê Hopka – nahiya Reco 19 Berçile 2010 an

* Gotina sekretêrê partiya Niştîmanî ya Democrat a Kurd li Sûriyê, birêz Tahir Sifok, ji hêla Ebdil-baqî Mele Mihemed ve- bi zimanê Erebî- hat pêşkêşkirin.

* Gotona hevalê bavê Qedrî yê damezrandina yekemîn partiya Kurd li Sûriyê, ji hêla birêz Dr. Xelîl Mihemed ve- bi zimanê dê tê pêşkêşkirin û ev e deqa wê: Hevalê berêz û bi rûmet Reşîd bavê Qedrî..

Ey hevalê riya dûr û

dijwar ,riya xebat, têkoşîn û zanayî û serbilindî, riya xizmeta gelê me û welatparastinê. Îro jiyana te gihîşte talî, lê jiyaneke serfiraz ,



xurt û mêrxas bû û tijî kar , xebat û têkoşîn bû. Jiyanêke tê de pir bûn rojên reş û şevên tarî.

Belê ey hevalê hêja , berî şêst salî te ramanek (fikrek) avête meydanê, raman û fikra mîletperwerî bû û xizmeta gelê bû. Li dor wê ramanê û fikrê çend heval kom bûn, ewna li ser pêçiyên destekî dihatin jimartin, heval gelek hindik bûn, lê barê te û hevalên te pir giran bû. Belê hêdî hêdî heval pir bûn , civiyar û kewrank tê de çêbû û birêket. Kewranê hevalan bi riya rastrîyê û

mamosteyên gewre her çû mestir bû.

Belê heval, tevgera te û hevalên te pêşverû bû, ku jîna wê pêşve here, hinek li paş man û jê qetiyar, lê ji wan pirtir tevî kerwanê bûn û her çûn pêşde çûn û kerwan her zêde û mestir bû. Tevgera gel her çû pêşve çû û gel li dorê kom bû û civiy, tevger tim li ser riya rast berve armanca gewre û mezin çû .

Birayê hêja, xebata te ne bes li ser mesele û qediya kurdî bû, mesela te di xizmetê welatê me Sûriyê de bû , di xizmetê yekbûna welêt de bû, di xizmetê dostayeti û biratiya Ereb û Kurd û hemû neteweyên din de bû, di xizmetê aşiyê de bû , demokratiyê de bû û heqiyê de bû . li ser te em çî denkin, heval Hemîd û yê din pir tiştên te yê baş hewaldan , ez nabînim carek din bêjim .

Hevalê têkoşîn û xebatê, em çiqas bipeyvin û biaxivin , em nikarin mafê xizmetê û xebata te bidin, gelê me te baş nas dike, mîletê me te baş dizane û bi çavekî bilind û qedrekî mezin li rolê û tevgera te temaşe dike .

Bira û hevalê delal

Vaye tu gihîşte
koça dawî , lê te gelek
ji jiyane hez dikir
û te nedixwest
zûzû xatirê xwe ji
jiyanê bixwezî .
Belam asayî û zafana
heyîn û aferînê ciyê
xwe girt



Hevalê hêja, em çî

bêjin çî nebêjin êşa te di dilê me de ye û tu tim wê di bira me de bî . Em hêvîdarin ku gorna te wê rind be û ciyê te li ser pelê û herîr be. Çevên xwe di xaka welêt de, û di nav hevalan de xew ke . Îro cejne , û ne roja şîn û girî ye , îro hogirên te hatine xatirê xwe ji te bixwazin û te birêkin. Heval..! Ji me re **D.R.(8)**